

Pirs

Kovarek rewşbîrî serbixwe
ye Hejmar 35 ~ Bihara 2006 an

Pêrist

*~Gotina me	Pirs	2
*~Rewşên Îdarî	D.M.Elî	3
*~Neroza Şamê	Şêx Birîmce	5
*~Rojên rojnamegeriyê	M.Berekat	6
*~Ferqa di navbera	Arêf Zêrevan	
*~DeqekjiHewarê		11
*~Dewletên Kurdî	Kejalê Kurmênc	13
*~Kurte jiyana qasimlo	Cefer Mehmûn	16
*~Zanişwer	Pirs	19
*~Pala rabe	Rezoyê Osê	20
*~Rêzman	ji pirtûkê	24
*~Îslam û ziman	Fîr Rstem	26

Çîrok

*~Ê Fîn	Salih Bozan	29
*~Xewna Hêviyan	Zamdaê Zindî	37

Helbest

*~Ji pirtûkxana Kurdî	pirs	42
*~Bêhûd		44
*~Niklên tar	Oflaz	45
*~Hevdîtina Pêximberan	Dîlan Şewqî	46
*~Qamişlo	Bextreş (bavê Memo)	47
*~ Remû Bike	Nûsîn Bêcirmanî	48

Gotina me..

Xwendevanên me yê berêz..

Hejmara Kovavara ((Pirs)) a yekê di sala 1993 an derket. Wê hingê desteya berpirsyar li xwe girtibû ku kovar demsalî be, yanê her sê mehan hejmarekê derxe. Lê mixabin ew yeka han bicih nehat û biryar ne çû serî.

Hejmara Pirsê ya dawî nimre 34 e. Ango, dizikhevde, her çar mihe û nîvan hejmarek derçûye. Bêguman, ev jî cihê mixabinê û rexnê ye.

Erê, tiştên ku dilê mirov dixwaze, li xwe digre û ji xwe re dike biryar, pir caran bihêsanî bicih netên. Ji ber ku, ji pêk anîna her karekî re derfet û amadekarî gerek in. eger peyda nebin, hêvî û dilxwazî, ne tenê diçelmsin, dimrin jî.

Di baweriyaya me de, pirsgirêkên kulekbûna kovara Pirsê, ne yek û didu ne, piralî ne, carina bi hev re derdikevin û carina teketek tên, nemaze wan astengan, di çend sal û hejmrên kovarê yê dawî de serî hildidan û hikarî li karê me kirin.

Atenga yekê, pirsgirêkên çapê ne. Em dizanin ku tu çapxaneyên Kurdî li Sûriyê tunene. Çapxaneyên taybet jî dibin çavdêriya dewletê de ne. Rûpelek çî ye - bi çî zimanî dibe bila bibe - çê nabe bê destûra dewletê were çap kririn. Eger bi zimanê Kurdî be jî, hîn qedexe girantir dibe.

Astenga diduyê, nivîsar in, em baş dizanin ku gazinên xwendevanan ji wî alî de hene, û gelek in. ji lewre jî em bi hêvî ne û li bendê ne ku nivîskarên zimanê Kurdî ji me re alîkar bin, ji ber ku, gava kovareke hêja bi zimanê Kurdî derkeve, ji me hemiyar re sûd û serbilindî ye.

Astnga sereke ya sisiyê jî, xwendevan e. Erê rast e ku nivîsara baş xwendevanên baş dafrîne, lê sed mixabin, xewndin û nivîsandina bi zimanê Kurdî, roja îro, di deraqekî zor xirab de ye. Belkî ji sedî pênc ji mirovên Kurd li Sûriyê zanin û kanin bi zimanê xwe bixwînin. Ev jî pirsgirêkeke netewî ye zor giran e, hest û qîreta nivîskar dişikîne û lawaz dike.

Xwendevanê hêja..

Ji Hêla çapê ve, desteya birêvebir a nû ya kovara me, li xwe girtiye ku hemî derfetên ku di dest de hene bikar wînin, da wê her sê mehan birêkûpêk biweşîne.

Lê çareserkirina herdu astengên din li qîreta xwendevan û nivîskarên me dimînin.

zor pêwîste em li zimanê xwe xwedî derkevin. Destek bi tenê li çepkan naxîne. Divê em hemî bi hev re govendê bigerînin, da wê şên û rengîn bikin.

Desteya birêvebir

Rewşên Îdarî li Çiyayê Kurmênc

li serdemên berî Osmaniyan

Dr. M.Efî

D Di nava demê de, navça Çi.Kurmênc ya îro, bi gelek navan hatiye bi navkirin. Kurd jê re dibêjin Çiyayê Kurmênc, Osmaniyan Kurdax lê kiri bûn. Paşê, piştî ku Ç.Kurmênc kirin du perçe, Sûrî û Tirkî, Ereban ew nav wergerand zimanê xwe û jê re gotin ((Cebel El-Kurd)). Beşê Sûrî ji Ç.Kurmênc, niha bi navê Navça Efrînê tê naskirin, ew jî li ser navê Bajar û çemê Efrînê yê ku di nav bajêr re diherike.

Di serdemên têvel de, Ç.Kurmênc ketiye bi destê gelek hêz û gelên ku ji nijad û şaristaniya xwe de têvel bûn. Lewre her yekî ji wan mora xwe lê daye û kevnerêçên xwe li dû xwe hiştine, pê têkildarî û girêdana navçê bi wan ve tê nasîn.

Wek hatiye nasîn, ew Têkildarî û girêdanên îdarî yên ku hatine naskirin weha bûn:

Di destpêka dema Yûnaniyan de: Rêberê Yûnanî Slûqîs Nîketor di sedsala sisîyan Berî Zayînê (B.Z) de, bajarê Sîrosê (Nebî hûrî) di navenda herêma Çiyayê Kurmênc de ava kir. Gumana

bêtir ew e, ku Sîros û herêma wê ji hêla kargerî ve serbixwe bûn, (Kovara El-Feysel – Ebdela Hecar).


Di dema Romanan de: Bajarê Sîrosê Navendek bû, bajarê Bîriwa (Heleb) pêve girêday bû, (El-Dur El-Mintexeb, rûp-30). Di wê demê de, Bakurê Sûriyê parve sê herêmên kargerî(îdarî) dibûn; Yek jê Sîrostîk bû, paytexta wê bajarê Sîrosê bû (Dîroka Heleb, Sewaf, rûp-51). Lê di sedsalên diduyê û sisîyê yên zayînî de, girîngiya bajarê Minbicê bêtir dibû, dibû paytexta satrapa (wîlayet) Ferêt, û Sîros pê ve dihate girêdan.

Di serdema Bîzentiyan de: Piştî sedsala çaran a zayînî, herêma Sîrosê dima perçek ji satrapa Ferêt. Hîngê şaroçkên Şêx Xoros (Şêxorz), Meydank, Ezaz, Kilis, Cibrîna Ezaz, Ekidê, Niyara û Şêx Rîhê bi ser ve bûn(1).

Di serdema îslamî de: Bajarê Qinistrînê(Heleb) dibû navenda Kargerîyeke sereke, gelek navendên leşkerî û bajarok pê ve dihatin girêdan. Sîros û deverên

wê, carina bi Qinisrînê û carina bi Entekê ve dihatin girêdan. Lê xuyan dibe, ku di dema îslamî

deh, yazdeh û dozdehên zayînî de, di navbera îmaratên Heleb, 'Entek û Rihayê de, yanê di



de, deverên Cûm, Şiyê û cindirêsê bi ser navçeyên 'Entekê ve bûn (El-dur El-muntexeb, rûp-206).

Lê dema ku mîritiya Rihayê ya Selîbî çê bû, navçeyên Sîrosê bi ser wê ve diçûn, û wilo diman, ta dema ku bajarê Rihayê û keloşkên wê yên li Rojhilatî Ferêt di sala 1145 Z. de diketin destê Îmadidînê Zengî.

Di dema Zengiyan de, navça Sîrosê dibû meydana şer di navbera Selîbî û Zengiyan de, ta Selahidînê Eyûbî li dawîya sedsala dozdan a Zayînî de, tewir dest danî ser û xiste nav mîritiya xwe. Lê belê li destpêka dema Eyûbiyan de, girîngiya bajarê Sîrosê her çû bû kêmbibû, ta li dawîya sedsala dozdan a zayînî, bi carekê kaviil û vala bû.

Em kanin bêjin, têkildariya Sîros a siyasî û kargerî, di sedsalên

navbera Mislîman, Bîzentî û Selîbiyan de diçû û dihat. Di serdema Eyûbiyan de: Navçe parve çend mîritiyên biçûk dibû, li ser mîr û serleşkeran hetî bûn belavkirin. Çiyayê Lêlûn û perçê başûr jî deşta Cûmê ra devera Hêrimê, di destê Xalê Selahdîn de bû. Li ser sînorên Hêrimê yên wê demê, pirtûka El-Dur El-Muntexeb wiha dibêje: ((...Li rojhilat çiyayê Lêlûn e, gelek kanî tê vedibin, bi darûber e, ji bakur ve li ba pira Qîbarê ya li ser ava Efrînê bidawî dibe)). Beşê Bakur jî ji Çi. Kurmên, bi ser Ezazê ve çûbû, ew jî di destê Biraziyê Selahdîn, ê bi navê Teqîyidîn Umer de bû(2).Lê belê Di dawîya serdema Eyûbiyan de, beşê başûr jî Kurdaxê û devera Cûmê, dibû para mîrekî kurdan î

bi navê Mîr Mend. Ew destpêkê, li keloşka Qusêrê ya li deşta Hêmqê, li başûr rojavayî Hêrimê ye rûdinişt, (Şerfname- rûp-230). Lê ji destpêka sedsala çardehên zayînî de, piştî ku dewleta Eyûbiyan ji rû ket, navenda destlatdariya mîrên Mendiyan rabû bajarê Kilisê, li rojhilatê Sîrosê bi dora 15 k.m. ye.

Û ji hîngê ve, sînorê Mîritiya Mendiyan bi bakur û rojhilat de fereh dibû, Cûm û Ç.Kurmênc du deverên wê mîritiyê bûn, (Şerfname- rûp-230). Ew mîritiyeke serbixwe bû destlatdariya Memalîkan li ser tunebû, û serbixwe ta destpêka serdema Osmaniyan. (Nexşe -1).

¹ - Gotarin di kevnerêça Sûriyê de, Bûlis Yetîm, rûp- 80.

³ - Du bihişt, El-Meqdisî (1200-1268) , rûp - 71.

Newroz li Şamê 1956-1957

Şêx Birîmce

Newrozê li Şamê ji zû de destpêkirî ye, berî hemî hermên kurdên Sûriyê, di sala 1956-1957an, komek ji zanayar û xwendevanên kurd li Şamê piraniya wan (ji Kurdistana Iraqê bûn) Newroza xwe li surušta bajarê Zebedanî (nêzîkî Şamê 60km) pîroz kirin, yê nas dinav wan de, Dr: Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrî Cemîl Paşa, Qedrî Can, Îsmet Şerîf Wanlî, Cemşîd Celatet Bedirxan, Remo Hiso, Mihemed Zilfo, Umer Dezeyî, Ezedîn Mustefa Resol, Û Umer



ROJA ROJNAMEGERIYA KURDÎ

Merwan Berekat



Sed û heşt salan berê, yanê di 22 Nîsanê 1898 an de, li Qahîrê . Rewşenbîrê kurd yê gewre, mîr Miqdad Bedir-Xan biryar çapkirina rojname KURDISTAN dabû. Rojname bi zimanê kurdî bû, ji hejmara yekê ji Kurdistanê, ta ya dawiyê, gelek bend û asteng di riya wê de disekinîn. Lê li viyana Mîrê gewre, ji hemû astenyan bi hêztir bû . Ji lew re jî, roja 22ê nîsanê, rojeke pîroz e, roja damezrandina rojnamegeriya kurdî ye. Ji her kurdekî tê xwastin, rola bedirxaniyan ji bîr nekin, ji ber ku ew û rojnamegeriya kurdî, ji hevdu cûda nabin û stûnê bingehîne di warê rewşenbîrî , ziman û rojnamegeriya Kurdî de, bi taybetî ji sedê Nozdan, ta nîvê sedê bîstan .

Bedirxanî têne nasîn ko tu carî ji bin siya ala welatparêziyê bi derneketine û tu carî berjewendiya xwe ya kesîti nedane pêşiya welatparêziyê , û tu carî di riya kar û xebatê de ezîti ne

dane pêş.

Belê Bedirxaniyan, ji bo gelê xwe û netewa xwe , ji bo

rewşenbîriya kurdî , her û her tengzarî, êş, belengazî û sirgonî dîtine .Lê tu carî serê xwe netewandin, ji riya netewa xwe derneketin, li bilûra zordariyê guhdar nekirin û jiyana xwe bi erzanî bernedane.

Kurd bi tev dinizanin ku dîroka Bedirxaniyan ji her alî ve zengîn e. Ji aliyê konevanî ve xwedî şoreş in û di warê rewşenbîriyê de jî xwedî rolake rengîn in . Celadet Bedirxan xwendevanên hêja zimanê Kurdî bi tîpên latinî û rêzimana kurdî bi zaravê Kurmançî daniye .

Rast e her salê carekê fîsteval û sîmenar ji bo roja rojnamegeriya Kurdî û rojname Kurdistan çê dibin, lê têbîn , rexne , pesin , dîroka

rojnamê û hejmarên wê û li kîderê belavbûye û hatiye weşandin û di kîjan çapxanê de hatiye çapkirin tê ziman , bi devokî û bi nivîsandin û belkî bi dehên gotaran, di rojname û kovarên kurdî de li sûriya têne weşandin . Lê mixabin belê mixabin yek gotar ji bo malbeta Bedirxaniyan nayê xwendin yan jî nivîsandin , Eger carna hebe jî, pir kurt e, ne li gorî daxwazê ye.

Wekî têye nasîn ku, ziman nasnama netewan e û rojnamegerî jî zimanê miletan e, ew roleke pir girîng di warê konevanî , aborî û civakî de dilîze.

Riya rojnamegeriyê dijwar û bi asteng e, bi taybetî jî rojnamegerîya Kurdî li Sûriyê. Ew rojnamegeriya rast ya ko, di riya dijiwariyê de rêber be, û ew rewşenbîr û nivîskarê rast ê ku xwe dike mûm û quncikên tarî di rojnamegeriya Kurdî de ronî dike barekî pir giran hildigre.

Eger em bixwezî tevgera rojnamegeriya Kurdî li Sûriyê bidine ber rojnamegeriya cîhanê. Bi rast belkî navê wê nebe rojnamegerî û ew nav jê

re giran be, ew jî ji ber gelek tiştan:

1- Yek ji mercên pêşketina rojnamegeriyê, pisportî ye. Lê mixabin ev merc di yek rojname kurdî de nîne , ji ber wê jî berhemên ku têne weşandin gelek sêfil in, çî di aliyê zimên û çî di aliyê ramanê de.

2- wekî têye nasîn, rojname rojane ye, yanê roj bi roj tê ye çapkirin û weşandin û bûyerên teze digîne cemawerê xwe . Eger ne rojnane be heftane ye, yanê ji heftê carekê çap û belav dibe ,lê mixabin yek rojname kurdî li Sûriyê ne rojane û ne jî heftane heye. Ya bi zû bi derdikeve ji heyvê carekê yan jî ji du heyvan carekê ye .

3- Şêweyên belavkirinê pir kevnar û teng belav dibin , yanê eger rojname ya partiyan be hema her yek dide heval û dostên li der dora xwe. Eger mirov bixweze navê rojnameyên Kurdî ji miletê kurd pirs bike, Sedî Nod ji milet navê rojnamên Kurdî nas nakin .

4- Rojname divê bi bûyerê re be û wê di demê de têxîne nav destê xwendevanan. Yanê

ne pêştî du sê heyvan nûçeya bûyerê bigîne destê xwendevanan . Rast e sedemên ev kimkasiyên jorîn gelek in wekî rewşa aborî , konenvanî , perçebûn, qedexekirin û astengên bê jimar, lê digel wê, divê rewşa rojnamegeriya Kurdî ne di vê qonaxa nizim de be.

Ji bo ev rewşa ne li gorî astê hin pêşniyaz ji bo komîteyên berpirsiyêrên rojname û kovarên kurdî ê li Sûriyê çap û belav dibin, hene, çi bi zimanê Erebî û çi jî bi zimanê Kurdî, çi ên partiyan û ci jî ên serbixwe eger hebin :

1- Zû derxistin : yanê bi zû derkevin û zû biginine destê xwendevanan.

2- Fireh belavkirin : yanê divê pir belav bibin û biginine destê hemû nivîskar , rewşenbîr û agahdarên Kurd û Ereb .

3- Têkilî di navbera komîteyên berpirsiyarên kovar û rojnaman de hebin û bi hev re alîkar bin,

4- Ji aliyê teknîkî ve, divê kovar û rojname hinekî li pêş bin, nêzîkî demê bin.

5- Komîtî berpirsiyar û bi

taybitî ên kovaran, çalakiyên xwe di gel xwendevan û rewşenbîran pir bikin ,yanê şev, sîmener û fistevalan ji mehê carekê çê bikin.

6- Ji salê carekê, an du caran , di civîneke rewşenbîrî de , nivîskarekî , helbestvanekî an çêrokvanekî xelat bikin ,

Li dawiyê , di baweriya min de, bi riya kovar û rojnamên bi zimanê Kurdî tene weşandin, zimanê Kurdî tê parastin û rola xwe di parastina giramatîkê de jî baş heye. Ji ber vê sedema girîng û hin sedemên jorîn , ji nivîskar , zimanzan , hozan , helbestvan û hemo rewşenbîrên Kurd tê xwestin Ko her yek gor kanîbûn û zanebûna xwe pênûsê xwe têxîne xizmeta kovar û rojnamên Kurdî û jê re bibin alîkar, ji ber bi me Kurdan wergî gereke û Kurdayetî wilo dibêje, ez jî ji dibijim :

Agirê xwe Di argûnê xwe de gur bike

Ramûsana bi tîn Li ser lêvên dîlbera xwe sarbike

Xwîna pênûsa xwe Di rehên zimanê xwe de, bigivêşe

Ferqa di nêvbera

«ko», «ku» û «kû» de

Nivîskar: ARIF ZÊREVAN

Malpera NEFEL

H Hinek xwendevanên me carinan ji me re nameyan verêdikin û dipirsin, ka çima em di portala Nefelê de gihaneka «ko»-yê bi «o»-yê dinivîsînin û ne bi «u»-ya kurt. Çend sebêbên wê hene û ez dê li vê derê bi kurtî behsa hinekan bikim .

Berî hertiştî divêt ez bibêjim ko dengê «u»-ya kurt dengê ji du dengan pêkhatîye û eslê wî dengê «wi» ye. Di hinek bêjeyên Kurdî de herdu dengên «wi» pir nêzîkî hev bûne û dengê nû yê kurt jê çê bûye û Celadet Alî Bedir-Xanî ji wî dengê re «u»-ya kurt peyda kiriye. Yanê eslê bêjeya «Kurd, kurt, kurm, kum» û bêjeyên wekî wan «kwird, kwirt, kwirm, kwim» e, lê belê ew paşê hatine guhartin. Heta niho jî, li devera Botan, bêjeya «kurm û kum» wekî «kirm û kim» têne gotin yanî «w» dikeve û «i» dimîne. Vêca heçî gihaneka «ko»-yê ye, nikare wekî «ku» bêt nivîsandin ji ber ev «o» ne ew «wi»-ya nêzîkî hev bûyî ye .

Di zimanê Kurdî de sê bêje hene ko bi alfabeya Erebî ji hev nayên vavêr kirin û hemî jî bi «kaf » û «wawê» yanî wekî «kw» têne nivîsandin. Ev hersê bêje hem dengên wan ji hev cida ne, hem jî maneyên wan ji hev cida ne, ji ber hindê jî, damezirênerê alfabeya Kurdî ya latînî Celadet Alî Bedir-Xanî sê herfên cida ji wan sê dengên cida re payda kirine û ew ji hev vavêr kirine. Piştî mirina Celadet Alî Bedir-Xanî hinek Kurdên ko bi alfabeya latînî dinivîsînin ferqa di nêvbera gihaneka «ko» û hokera «ku» de nedîtin û herduyan jî wekî «ku» dinivîsînin .

Ez dê berê behsa maneyên van bêjeyan yê cida bikim û ji «Memozînê» nimûneyan bidim:

Ko = heger... Ku = çi, çawa... Kû = kîjan dever.

Yê ko alfabeya Kurdî ya latînî amade kiriye û dengên Kurdî li wan tîpan siwar kiriye Celadet Alî Bedir-Xan e. Wî ji bo gihaneka «ko»-yê tîpa «o»

bi kar aniye û bi zanebûn «u»
bi kar naniye û «Hawar» hemî
bi wî awayî derxistiye. Herçî
«ku» ye, ew bêjeyeka
serbixwe ye û maneya wê
yekcar cida ye. Ev bêje li

We zû emirand ji bo çî sersal?
Hon rast bibên ku [çî, çawa]
bûye ehwal ?
Hon bêjine min ku [çî] bû
qediyê ?
Kengê li me xef dibit xebiyê
Mecnûn ko [heger] nebit 'edîlê
Leylê
Leylê ku [çawa] dikit bi Leyl
meylê ?
Go ez ku [çî] bibêm bike tu
bawer ?
Dawer bi mi ra ko [heger] bûye
yawer
Em dê ku [çawa] heqîqetê
'eyan kin ?
Serriteyê tuhmetê beyan kin
Ger fewt bikim cemî'ê ferzan
Tacdîn ku [çawa] didim ji dest
xwe erzan?

Jixwe minaqeşe li ser «kû»
nîne ji ber ko hemî kes dizane
wê kusan (çawa) bi kar bîne lê
belê cardî jî ez dê nimûneyekê
ji «Memozînê» binivîsînim .

Wan go tu ji kû ve tê, çî pîr î
Xalib tu ji 'ilmekê xebîr î

devera Hekariyan û Goyan
pir belav e û di cihê «çî» û
«çawa» de têt bi kar anîn û
Ehmedê Xanî jî ew bêje gelek
caran di «Memozînê» de bi
kar aniye :

Piştî gelek lêpîrsînan jî,
min nezaniye ka çima Kurdên
bakur piştî mirina Celadet Alî
Bedir-Xanî gihaneka «ko»
guhortin û kirin «ku»?.
Texmîna min ew e ko Kurdên
bakur ji tesîra «o»-ya qelew ya
tirkî rabûn «ko» wekî «ku»
nivîsîn da wê wekî «o»-ya
Tirkî qelew bi lêv nekin.
Heger wisa be ew sebebekê
bêbingeh e ji ber tîpa Kurdî
«i» jî wekî tîpa Tirkî «i» têt
nivîsandin lê belê dengên
wan ji hev cida ne .

Vêca jî ber maneyên cida û
ji ber denganiya cida ya hersê
bêjeyên Kurdî, divêt ew wekî
«ko», «ku» û «kû» bêne
nivîsandin. Ez jî hem di
nivîsar û berhemên xwe de û
hem di berhemên ko ez amade
dikim de xwe dispêrim metoda
Celadet Alî Bedir-Xanî û wekî
wî dikim.

ARMANC, AWAYÊ XEBATÊ Û NIVÎSANDINA HAWAR

Hawar dengê zanînê ye, zanîn xwe nasîn e.
Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşîyê vedike.
Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin.
Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas kirin.
Lewma ko zman şertê heyînê a pêşîn e.

Karekî ko bikare biçê serî, divê jê re pronivîs ango programek bête çêkirin. Me pronivîsa xwe ser bingehên jêrîn lêkiriye:

1- belavkirina

Elfabêya Kurdî di nav Kurdan û hînkirina wê.

2- Berhevkirina

çîrok, çîrçîrok û her texlît laje û stranên Kurdî û birêve belavkirina wan.

3- Senifandin û belavkirina dîwanên Kurdî. Bi van ve jînenîgarîya şair û mirovên bijarte jî dê bîn belavkirin.

4- Sehîti ser her texlît rêzkên Kurdî û Kurdistanê, yên zmanê borî û yên îro û senifandina wan. Sehîti ser hatinên Kurdistanê û pîş û sinhetên wan.

5- Dîrok û erdnîgarî: Sehîti ser tevahîya dîrok û erdnîgarîya welatê Kurdistanê û ser dîroka eşîran, berî, pasî û di wextê mîr Şeref de.



Awayê nivîsandinê:

Di heqê zmanê me de niho gelek tişt hatine gotin. Di nav van gotinan tiştên rast û nerast jî hene.

Ez ku Kurd û Kurdmanzman im û zmanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt

zmanên din daniye ber hev, kitkitên wê hûrhûnandine; qeydeyên wî ji hev derxistine, dikarim ji biyaniyan bêtir û qentir dehkera wî bidim xuya kirin û zanîn.

Zmanê me îro hem freh û hem teng e.

Freh e: Bi her tiştê ku Kurd pê mijûl bûne, dest dane wan, di wî warî de zmanê Kurdî hing

zmanên din û ji hinan bêtir pêşve çûye û kemiliye, û ji tu zmanên kemilî bi şunde ne maye.

Teng e: Herçî ko ji Kurdan nenas mane û Kurd pê mijûl ne bûne, di wî warî de zmanê me rawestiyaye, pêş ve ne çûye, di cihê xwe de maye. Lê zmanê me ji wan zmanan e ko ber her tiştê nuh, pirsên nuh dizên û birêve pirsên nuh ji wan çar dibin.

Herwekî xelkê Gelîyê-Goyan, berî çardeh salan, gava tiyare dîtîn, tavil bi zarê xwe Balefir lê kirin. Ji lewre ko ji banî, ji bala difire. Dîsa Kurdmancên ko telêfon dîtîn, ji mesmeha wê re bihîstok gotin. Ji ber ko deng pê tête bihîstin.

Niho em vegerin ser gotina xwe, ser awayê nivîsandina zmanê xwe.

Îro di zmanê me de du texlît kêmanî hene: Windabûna pirsinen Kurdî û ketina pirsinen biyanî nav zmên.

bê hawara Hawarê.

Em çî bikin ko zmanê me bikare veger ser xurîtiya xwe û di nav zar û zarawayên xwe de bikemile û bibe zimanekî tekûz?

Di windabûna pirsan de, pirsin hene yekcar winda bûne, hin hene ji zarekî ketine lê di zarekî din de dijîn û çendek hene di axaftinê de kêmtên gotin lê di mamik, medhelok, çêrok û stranan de tên bihîstin.

Em li pey wan in, hîn bi hîn em wan diêxin dest û diseniffîn û gora mehçetê jî ji nuh ve ser awayê hevedudanîna pirsên Kurdî pirsine nuh çêdikin.

Hawar zarokeke nûza ye. Zarowa me ye; zarowa Kurdan e. Wek her zaro bi xweitiya dê û bav, bira û pismamên xwe dikare bijî. Herkes, her Kurd dikare arîkarîya hawarê bike.

Tukes mebêje ko, ez mirovekî reben û nekêrhatî me. Ji min ji diayê pêve tiştêk nayê.

Belê tukes vê xeberê mebêje, herkes bi tiştêkî, bi awakî dikare

.....
: **Em jî gotina Mîrê xwe dubare dikin û dibêjin:**
: **Tukes mebêje ko, ez mirovekî reben û nekêrhatî me. Belê tukes**
: **vê xeberê mebêje, herkes bi tiştêkî, bi awakî dikare bê hawara**
: **Pirsê.**
:

Dewletên Kurdî Piştî ola Îslamî

Kêjalê kurmênc

J Ji berî ola Îslamî, Kurdan, li gor gomanan, bi sîstemên eşîrtî an jî bi komîkeyên bi çûk û teng jiyana xwe doman dine. Dema di herêmê de ola Îslamî belav û xort dibû, gelê Kurd xwest ola xwe ya kevinar biparêze .Lê leşkerên Ereban êrişên dijwar dibirin ser Kurdistanê . Şer di navbera Kurd û leşkerên Îslamî de derdiketin holê .

Leşgerên Îslamê di dema Elxelîfe – Umer de Mûsil , Mêrdîn û Rihayê dagirkirin.

Di navbera salên 639-644 ên piştî zayîne de, dagirkerên Ereban , ber bi Kurdistanê rojhilat û Îranê ve meşîyan. Piştî salên 730 ê zayîne, Kurdistan bi tevayî tar û mar û wêran kirin, hebûn û şaristaniya Kurdistanê

nehîştin, tev wêran û şewitandin. Li dawiyê, piraniya Kurdan ola Îslamê qebûl dikirin. piştî erêkirina ola Îslamê êdî Kurdan xwe jî Îran û Romê bi dîrdixistin û ev car ketin bin bandora Ereban. Kurd di bin hukmê Ereban de jî gelek serhildan pêkanîn , mîrîtî û dewletên herêmî yên bi çûk, damezrandin.

1-Dewleta Hesnewî :

Dewleta Hesnewî , li gor hoyên demê dewlet bû, lê dewleteke herêmî bû. Li Kurdistanê başûr, li bajarê (Cîbel) Xwenedanekî Kurd bi navê "Hesnewî" her ku çû , cemawerê xwe bêtirkir , di sala 941ên (p.z) de serxwebûna xwe diyar kir pêre rêxistina dewletê û ya

ordiyê pêş ve bir. Bajarê Hemedan , Mehabad , Kermanşah û Şarezor ketin nav tixûbên dewleta Hesnawî. Dewleta Hesnawî pere û pûl çêkirin , sîstema abariya navendî pêkanîn. Li Kurdistanê rê û avahî çêkirin, dewleta Hesnawî heta sala 1014 an jiyana xwe doman.

2- dewleta Şedadî:

p-z-di sala 951an da, serokê eşîra Rewandî Mihemed Şedadî dewleta Kurd a şedadî damezrand. Tuxûbên dewleta Şedadî ji bajarê Rewendozê heta bajarê Genja - Ezirbêcana sofyatê – berfireh bû .

Di dema dewletê – şedadî de , jiyana çand û civakiya Kurdan gelekî bi pêşket. Di sala 1088 an de, Şahê Selcûqî , êrişeke mezin bir ser dewleta Şedadî û dawiya dewletê anî.

3- Dewleta Merwanî .

Piştî zayinê, di sala 985 an de , Bad Dostik dewleta Merwanî damezrand û Miyaferqîn (Cilîwan) ji xwe re kir serbajar. Di dema gelekî kin de tuxûbê dewleta Merwanîyan firehbû . Nisêbîn , Cezîra Medan, Amed, Riha ,

Bedlîs û Melezkurd bûn. Bi taybetî di dema Padişahê Merwanîyan (EHMED) de xelik di jiyaneke azadî û serfirazî de dijîn.

Di nav tuxûbên dewleta Merawnî de, şaristanî û hunermendî gelekî pêşketi bûn , bedenên Kela Meyaverqîn û Amedê ji nûve hatibû çêkirin .

Ji dervayî bajêr, av anîn û gelek , mizgeft , sera û pire hatin çêkirin .

Di sala 1043 an de , siltanê Selcûqî, Tugrol beg , bi seroketiya Tuga û Nasiglî de, 1000 siwarî dişşne Miyaverqînê , lê leşkerên Selcûqîyan ji aliyê leşgerên Merwanîyan ve het şikandin . Ji wê rojê ve , biveya Turkan piçekî dûrket .

Di sala 1086 an de , siltanê Selcûqîyan Nizam-Elmilk fersenda êrişekê dît û leşgerên xwe şandin ser dewleta Merwanî , Meyaverqîn û Amed ketin bin destê Tirkên Selcûqî . Di sala 1097 an de , dawiya dewlet û desthilata Merwanîyan hat .

D- Dewleta Zengî û İmbiratoriya Eyabî

Di sed sala 12 an de ,

serokê Zengiyan Nûredîn Mehmûd, li derhêla bajarê Kerkûk , Mosil dewleta zengî damezrand. Eyûbî , ji eşîreke Kurdistanî ya Rojhilat bû . Di wê demê de xaçparêzên Awripayî di ser Entekê ra , êrişê bajarê Qudsê dikirin – ne tirkên Selcûqî û ne ji dewleta Fatimî ya Misrê dikarî bû pêş li êrişên xaçparêzên Awripayê bigrin û bajarê Qudsê ji wan biparêzin. Serokê dewleta Zengî Nûredîn Mehmûd, ji bo parastina Qudsê dest bi êrişa xoçparêzan kir.

Ji bo vê yekê ,di bin serokatiya, Selah-Edînê Eyûbî de, leşker şand paytextê dewleta Fatimî- Misrê. Selah-Edînê Eyûbî , qumandarekî gelekî zîrek û qehreman bû. Li misrê Fersend dît û di sala 1171an de dest da ser dewleta Fatimî û hukimdariya xwa

diyarkir. li şûna dewleta Fatimî , dewleta Eyûbî damezrand. Xutbe li ser navê Ebasiyan xwandin . Selah-Edîn, bi serê xwa lebat kir, di sala 1174 an de tuxûbên dewleta Eyûbî ya Îslamî fireh kir û bû Imbîratorî . Selahedîn ji Kurdan hêzeke êrişkar û xort çêkir, bi qehremanî bajarê Qudisê ji xoçparêzên Ewripayî stand.

Ji xwe di dema Îslamê de , dewletên ku dihatin damezrandin, ne li gor netewan bûn , li gor îdelojiya Îslamî dihatin damezrandin, wek dewletên , Abasî, Fatimî, Osmanî ... Di sala 1192 an de , Selahdînê Eyûbî çû ser dilovanîya Xwedê. Niha gora Selahedin li bajarê Şamê ye û li ser kevirê gorê " Selahedînê Kurd" nivîsandiye



*Jêdar: Dîroka Kurd û Kurdistanê . Amed Tegrîsî û Aso Germiyanî

Kurtejiyana Nemir Dr. Qasimlo

Amadekar: Cefer Mehmûn

Ger mirov bixwaze li ser hemû warên jiyan û kesayetiya rêberê Kurd [zana û mezin, Dr. Ebdulrehman Qasimlo bas bike û binivîse, divê gelek lêkolînan bike û di çend pirtûkên mezin de bicih bike. Lê em li wir dê bi kurtî basa jiyan û kesatiya wî bikin.

Rêberê Kurdan ê zana û mezin Dr. Ebdulrehman Qasimlo di sala (1930)î de, ji malbateke Kurdperwer û welatparêz, li Gundê Qasimlo yê bajarê Urmîyê hate dinê.

Xwendina xwe ya destpêkî û navendî li bajarê Urmîyê bi dawî anî û ji bo berdewamkirin û domandina xwendina xwe çû bo bajarê Tehranê.

Qasimlo xebata xwe ya siyasî bi avakirina Yekîtiya Ciwanên Demokrat a Kurdistanê di sala (1945) an de li Urmîyê dest pê kir. Piştî hilweşîna Komara Kurdistanê di sala 1946 an, ji bo domandina xwendinê çû



Tehranê û di sala (1946) an, ji bo xwendina bilind çû Parîsê.

Ji zarokatiya xwe de hesta azadîxwazî û welatparêziyê di wî de dihate dîtin. Bo nimûne: Di çaxê desthilatdariya Komara Kurdistanê de, bavê wî, Mihemed Axa tevî Zêro Begê Herkî, Reşîd Begê Herkî û çend kesayetiyên Kurd yên mezin, ji bo çareserkirina Pirsgerêka Kurd diçûn Yekîtiya Soviyetanê. Paşî çend rojan vegerîn Kurdistanê. Dr. Qasimlo wê demê 11 salî bû. Yekem pirs ku ji bavê xwe dikir, ev bû: Ku we ji bo gelê kurd çî Kir û çî aniye?

Di sala (1953) an de, ew mecbûr dibû xwe veşêre û bi awayekî nepenî li Tehranê û Kurdistanê xebata siyasî û karê rêxistinî yê partiyê bike.

Dr. Qasimlo piştî 5 salan xebat û çalakiya siyasî û neteweyî li Iranê xasma li Kurdistanê, vê carê diçû Cekuslowakiya.

Sala (1962) an li Zanîngeha Piragê, Dukturaya Aboriyê wergirt û heta sala 1970 an di zanîngeha Piragê de dersa Aboriya Sermiyandarî, Aboriya Sosyalîst û Aboriya Teorî dida.

Di Konferansa Sêyem ya PDK Iranê de ku di (1977) an hate girêdan, Qasimloyê wekî endamê Komîteya Navendî û piştê jî wekî Sekreterê Giştî yê PDK Iranê hate hilbijartin û di hemû kongireyên Partiyê de wekî Sekreterê Giştî dihate hilbijartin.

Ew 18 salan wekî rêberekî zana, tekoşer û jêhatî di pileya yekem ya berpirsiyariyê de kar û xebata neteweyî û demokratîk di nav refên PDK Iranê de birêve bir.

Qasimlo hertim dijî şer bû, digot Komara Islamî şer bi ser gelê Kurd û PDK Iranê de sepandiye. Wî bawerî bi çareseriya pîrsgirêka Kurd bi rêya siyasî hebû. Lewre hertim digot ku pîrsgirêka Kurd ji rêya leşkerî nahê çareser kirin,

divêt bi rêya siyasî çareser bibe.

Dr. Kendal Nezan, Berpirsiyarê Enistîtûya Kurdî li Parîsê li ser kesayetiya Dr. Qasimlo li Goristana Pirlaşêzê wiha dibêje: "Iro di dîroka gelê Kurd de rojê girîng e. Bi rastî miroveke wekî Dr. Qasimlo kêm peyda bûne, ew akadamiyeneke mezin bû"...

Pirtûka wî ((Kurdistan û Kurd)) serokaniyeke mezin û dîrokî ye ji bo nasandina doza Kurdistanê. Dr. Qasimlo miroveke alim û zana bû. Di felsefe û wêjeyê de gelek têgihiştî bû. Bi çend zimanên cîhanê diaxivî. Lê mixabin, dijminên gelê Kurd ew pêxemberê aşiyê û mamostayê demokrasiyê ji me standin û bû yek ji mezintirîn şehîdên Kurdistanê.

Li roja (13.07.1989) an, dema ku Dr. Qasimlo û 2 hevalên wî, Ebdula Qadirî Azer, nûnerê PDK Iranê li derve û endamê Komîteya Navendî, û Dr. Fazil Resûl Kurdê Iraqî yê dostê PDK Iranê, ji bo çareserkirina pîrsa Kurd Li Kurdistana Iranê bi dîplomatên Komara Islamî ya Iranê li Viyena hati bûn ba

hev, ew bi destên têrorên dewleta Îranê hatine şehîd kirin, û careke din rûyê mele û Ayetulahên rûreş reş bû.

Bêguman xwîna Şehîdên me li arê naçe. Gelê me, li ser axa welatê xwe, ji bo azadiya xwe, bi salan ne xwînê dide, rojekê wer li cihê Şehîdbûna her Şehîdekî me, guleke sor dê şîn were û Kurdistan dê bibe Gulistan.


Bi boneya cejna
Kurdên me yên
Îzîdî di roja
çarşema sor de ,
destya kovara pirs,
wan pîroz dike.Û
Her sal xwaşiyê û
şahiyê jê re
dixwaze.

Bi boney arûniştina kongira şeşan ya pena Kurd, li bajarê Laybizk, Elmaniya . Kovar pirs kar û barên wan pêncî nivsakaran pîroz dike .Û Jê re serkewtinê dixwaze, ku digel nivîkarên din yên Krrd tev ciyê xwe di saziyeke kurditanî de bigrin , û ji ber raman û rewşenbîriya Kurd ve bixebitin, wê vejînin û nûdem bin.

Zanişwerek

Li gor dîroknivîsê Helebê El-Gezî, Mizgefta Mezin ya Helebê bi kevirên pîrozgeheke Agirperestan li wê şûnê bixwe bû hatiye girtin. Ew jî destnîşandike, ku di demeke berî wê de Micûs li heleb rûniştibûn.

Micûs olperestên Mediyân bûn, ew Zerdeştî bûn . Li ba wan, agir pîroz bû, ûcaqên wê yên nemaze hebûn, olperestên Zerdeştî (Micûs) li ber bûn û li wir dijîn. Wê hîngê Medî û pars Zerdeştî bûn. Ê wilo diyar dibe ku gelek Medî û Parsî li helebê rûdiniştin û laveyên xwe li ber wan ûcaqan dikirin.



**

Tebirdar: Berê, serdarên serbazan çekhilgirên xwe hebûn. Tebir, çekeke bû, mîna tevrên bû, yê ku hildigirt jêre digotin Tebirdar. Carina jêre digotin çerxcî jî. Qiral Nasir ji neviyên Selahedîn Tebirdarekî wî hebû. Tiştê ku bala mirov dikşîne, hîn Kurd ji wê alavê re dibêji ((Tevir)) û di karûbarê çandiniyê de bikar tînin.

**

Li ser deriyê Mizgefta Mezin li 'Ezazê wiha nivîsandiye: ((Di sala 644 ên Z. de hatiye avakirin, bi fermana seydayê me siltanê zana, dadmend, qeralê serkeftî , durustkerê ol û cîhanê Yûsif kurê qeral 'Ezîz Mihemed kurê qeral Gazî kurê Eyûb Nasir fermandarê bawermendan, Xwedêwo.. destlata wî nemirdî bike)).

Pirs

PALO rabe *

Rezovê Osê

Palo, ez gorî, rabe...

Xewa şêrîn ji hozanên weke te re nabe. Govend gera ye, dîlan mezin e, qet ranabe . Bi wî rengê te nivîsî, "Civîna Nemiran " timam nabe. De rabe qurban, serî ji gorê rake û li firokxaneya Hewlêrê , li Kurdistanana azad, li pêşwaziya Cengawerên "anfalan", li lehengên govenda jiyane, li Barzaniyên nemir temaşa ke. Rake, serî rake û ristên berdewamiya " Civîna Nemiran " li ba ke. Ristik dirêj e , pel têrê nake...Çarakê ji xwe re peyda ke. Aso bê kenar e, lê têra derd, kul , jan û azariyên gelê me ake.

Palo, ez gorî, rabe...

Çiyayên me bi fermîsk in, Zozanên me îske îsk in, deştên me, li ser gorbuhuştan, bi talîşk in. De rabe qurban, serî ji gorê rake û li xaka xemgîn

temaşa ke. Serî nextekî li ber xwîna gorbuhuştan daxê,



şaşika xwe, ji serî veke, li ber wan raxe, lê li min jî ha be. Erê, gewdê min jî, pêşî bişo, tahir bike, di bin linga ke, da 512 carî gewdê min û

Palo, ez gorî, rabe...

Çem û cobarên me mişemiş in, dar û deviyên me xuşexuş in, kewên zozanên me , li hêlînên xwe digerin, na melisin. Belê, hedana Pezkoviyan nayê, li zinaran bi karîn in, bi marîn in

, hespên mafparêzan bi hîrîn in ... De rabe, berê te fereh , xew ji hozanên weke te re nabe. Rabe, bake : "va penaberên me hatin, karexezalên me bi xelat in ...". Rabe, bikeve pêşiya cemawerê pêşewaz û sirûda " kes nelê Kurd mirdiwe ..." bibilîne. Rabe, bila zinar û çiyayên Barzan sirûda " Ey reqîb...." li hev vegeerînin, da xumîn û gumîne bi felekê bixin, wê bihejînin.

Palo, ez gorî, rabe...

Kurîhên çavên me ji girî kul in, perdên guhên me ji gumînan ker in , hestên me ji perçiqandinê mas in, dêmên me û welatê me ji êş, kul û derdan bewî ne , zimanên me di gewriyên me de lal in, hêriz di cergên me de pûç in, xelat û mizgînî li ba me bê wate ne, demên salê li ba me weke hev in...de rabe , rabe dengekî bi ser Leyla Qasim de bijênîne, bila desmala destê xwe sivik bihejîne , da govenda Nemiran , li pêşiya "Civîna Nemiran" bigerîne ... bila bi madgeşî û xwînşêrînî , dengekî, bi pêşewazî , ji mêvanên Çiyayê Barzan re,

bilîlîne ... Erê , dengê lîlandinê, ji me re, hem hêriz e , hem mizgîn e, hem jî xwîna nû, di rehan de , digerîne , dikelîne. Bila bake : " va anfalkirên me hatin , va firêliyên karexezalên Çiyayê Barzan hatin ... Ez di qurbaniya xwe de bi qurban bim , di nemiriya xwe de bi heyran bim ... Werin , mal mala we ye , çiya çiyayên we ne , azman azmanê we ye , xak xaka we ye... bi xêr hatin, li ser çavan hatin...xaka azad we hembêz dike , hatina we pîroz dike. Belê, serê şehîdan natewe , lê ez serê xwe li ber we ditewînim, ez ji we re hem xelat im, hem mizgîn im, hem jî xwîşka bi birîn im.. De werin, bi delalî, li civîna me, bihêwirin û li asoyê welatê xwe bibin ronî, bibin keskesora hêviyên çilmisî, da hûn welatê xwe geş bikin, biçîsînin..."

- 1 -

Palo, ez gorî, rabe...
Gêra "Civîna Nemiran" teng e, bi sînor e, şahsiwarê vê civîne, Barzaniyê nemir, bi nehtor e , textê mîrnişîna Kurdezan dor bi dor e,... De rabe, sînorên bedbextiyê biçîkîne,

nehtorên sexteşiyânê ji meydânê rahilîne, mîrnişîna padîşahan bi zêravê bikeşxîne... Rabe, rabe mizgîniya vê hatinê bigihîne, bila xaka azad xwe, vê payîzê, hilweşîne û gurzek gulên rengîn pêşkêşî mêvanên çiyayê Barzan bike û wan li xwe vehewîne... Reng e, dilê wan bi kul be, kula wan ji dil be û ji beyabanên biyaniyê ferehtir be, ji libên sîlaka wê ziwatir û gelectir be... kula lênepirsîn û dûrketina penaberiya be, kula bêrîkirina xaka şil be ... Bi wan bide zanîn, ko xaka welatê wan rêzgir û dilnermîn e, di payîzê de gulan ji wan re difûrîne, ava şêrîn ji tehtê diderîne û bayê jiyânê, li her derê, dilivîne.....

Palo, ez gorî, rabe...

Va payîz e, payizok e ... dewkeyênan meşk çirandin, bêrîvanan şîr rijandin, bilûrvanan va bilûrên xwe hilandin, zirnevanan va ne zirne li kirasan vegerandin, rojîgiran bang û bendên xwe dirandin... De rabe, darê şivantiyê bihejîne, kehnîkên çiyayê xemgîn bilivîne, biteqîne, perdê ji ser dar û

deviyan, deşt û zeviyan bide alî û roja asîmanê bilind dagerîne.. bila serê xwe li ber Cengawerên me bitewîne, bila bêje: "Ev mêrxasên rojhilat in, ev gernasên bêtebat in... berz û bala in, mam û xal in, ev rastiya vê şûnê ne, ev xwedanê cih û war in..."

Palo, ez gorî, rabe...

Ji xwe ha be, rewşa berçav bi coşe û hêriz nabe, li ser pêkan biqelize, xwe hêdîka bilivîne, bayê "Civîna Nemiran" ne şikîne, li civînê melikê Kurdistanê Şêx Mehmûd û qehremanê çiyê Barzanî ne, wa bi hev re, rûniştî ne, Qadî Mihemed li Mehabad wa bo wilo Çwarçira vêdixîne, Şêx Saîd jî va sûriha kevnedêrîn li Amedê dixumîne, Nûreddîn jî, bi goyînî, zîz dixwîne. Civîn giran e, bi dawî nayê, tu çarakê ji vê rewşê re xweş bibîne, bi dizîka, bi hêdîka vê bûyerê bigihîne, bibilîne... qet nebêje min nizanî, Cengawer û serkanên me ji hev ha ne, ev giyanên bêguneh in, bi rewanî li dera ne ... ji hev ha ne, ji hev ha ne...

Palo, ez gorî, rabe...

Bila îro ev pêşwazî li bîra be ,
 li bala be... va him him e, va
 gurîn e, va serkanên vê civînê
 li herderî rûniştî ne, bendewarê
 cengawerên nemirî ne.. Belê
 Palo, ew bi xwe jî timî sax in,
 bi jiyî ne , bendewar in, bi
 hêvî ne...Va dibînin, alên
 rengîn rêz bi rêz in, li hêlînê
 vehewî ne , xaka azad
 kurdezadan dicivî ne, gul û
 reyhan bo mêvanan
 difûrîne...Va serkanên
 mîrnişînê ji civînê derketî ne,
 ew dizanin, ne li benda tukesî
 ne, ew dizanin ev çi rewş e, çi
 birîn e , giyanên wan berî niha
 hevdû dîne , bi şêranî lev
 civîne, ji hev ha ne, xwexwedî
 ne, hemî sax in, ne mirî ne,
 soza wan jî ev civîn e.

- 2 -

Palo, ez gorî, rabe...
 Va te dît û tu dibînî, ev çend
 sal in dilbirîn î , lê birînên me
 axivîn, gul û beybûn, li welatê
 me , pişkiyîn ...Va Nemirên vê
 civînê , mil li mil in, bi şîranî,
 pêşewaz in , ne bi kul in... Ew
 dendika heskirinê , ko
 çandibûn, va teqiya , bû bi şax
 û her weha jî ber girtiye. Rabe
 Palo, dilê min jî dilodîn e, ew
 bi xwe jî wek Nemiran ,

rikgîriyê nahebîne ... Va
 serkanên vê civînê ji civînê
 derketî ne , ew dibînin
 Kurdewarên çarkenaran lev
 civî ne... rabe Palo , mizgîniyê
 bigihîne : " Miletê me , bi
 sayiya we navdaran, wê
 hevgirtî tim bimîne ". Tu jî
 Palo, çavnegirtî, pêûsa xwe
 verişîne û, ji nû ve, vê civînê
 bido

• Palo: Mele Ehmedê Palo (1920
 - 09.05.1991) helbestvanekî Kurd
 e. Li bajarê Qamişlo, herêma
 Cîrnîkê bi cî dibû. Poyemek, ji
 deh hezar malik, bi navê "Civîna
 Nemiran" hûnabû. Zîlana
 poyemê wisa bû : Palo dimire û, li
 wê dunyayê, M.E.Xanî dibîne.
 Palo dixwaze, di riya M.E.Xanî
 re , navdarên Kurd û goriyên
 kurdewariyê binase.Wilo , M.E.
 Xanî ji Palo re dibe rêber û
 navdaran bi wî dide nasîn .Wilo ,
 wî dibe civîna navdaran, ko navê
 "Civîna Nemiran " lê dike. Palo ,
 ji dûr ve , govendê mezin
 dibîne. Sergovend jî keçeke spehî,
 ciwan, naz , cansivik û çeleng e.
 Ew keç, di sergovendê de,
 desmalekê bi destan dihejîne û
 govendê, bi xwe re , dilivîne. Palo,
 ji M.E.Xanî dinase , ko ev keç
 Leyla Qasim e. Bi vî awayî , her
 navdarekî Kurd ji Palo re dibe
 sernavek û poyema xwe dihûne.

RÊZIMAN

J Ji ber girîngiya hin mijarên rêzimanî ji rênivîsê û rastnivîsê re, me baş dît ku em hin mijarên wê, bi kurtî, di her hejmarekê de biweşînin. Emê pir kêfxweş bin eger xwendevanên me di mijarê rêzîmên û rênivîsê de binivîsin û ji me re bişînin. Mijara me ya vê carê **Veqetandek(Zêder)**e.

VEQETANDEK*

V **Veqetandek:** Parkît in, bi dawiya navdêr, cinav yan rengdêrekê (*gava wek nav were bikaranîn*) dikevin, têkliya wan bi bêjeyên dû wan re pêk tînin, zayend û mêjera navdêrê jî didin zanîn.

Di kurmancî de, veqetandek du celeb in, ên navdêrên bîna, û yên navdêrên nebîna.

1. Veqetandekên **NAVDÊRÊN BÎNA** sisê ne :

Ê : Ji yekejimara zayenda nêr re :

Xortê jîr.

A : Ji yekejimara zayenda mê re :

Keça jîr.

Ên : Ji gelejimara herdu zayendan re.

Xortên jîr.

Keçên jîr.

2. Veqetandekên **NAVDÊRÊN NEBÎNA**, didu ne:

Î : Ji yekejimara zayenda nêr re :

Xortekî jîr.

E : Ji yekejimara zayenda mê û gelejimara herdu zayendan re.

Keçekê jîr.

Keçine zana.

Têbîn li ser veqetandekê:

1. Gava ji navdêrekê bêtir bi navedêreke din ve girêdayî bin, û hemî ji yek mêjerê bin, çê dibe ew bi yek veqetandekê

bi wî navî ve werin girêdan, veqetandek jî ji zayenda navdêra paşîn tê birin.

Kur û keça min. Keç û kurê min.

Ji dêvla : **Kurê min û keça min.**

2. Gava ji navdêrekê bêtir li dû hev hati bin û her yek têkildarî yê din be, hîngê her yek ji wan li gor mêjer û zayenda xwe veqetandekerê cihê dibe.

Pirtûka birayê hevaleke min.

3. Lê eger di nav wan navdêran de rengdêr hebin, hîngê veqetandeka navdêra ku rengdêr salixa wê dide , dikeve pêşiya her rengdêrekê, wan bi navdêrê ve girêdide. Hîngê ew veqetandek mîna cinavekî tê nasîn û wê navdêrê dinimûnin.

Gulên gulîstanê yên zer.

Di vê nimûnê de, a zer gul e ne gulîstan e, lewre veqetandeka gulan (ên) dikeve pêşiya rengdêra wê.

Cinavên ku ji veqetandekan çê dibin, li gor zayend, mêjer, binavkirin û nebinavkirina navdêrê wiha ne:

- **Navdêrên binavkirî :** Ê, A, ÊN

Yekejimara nêr: Xortê jîr ê bedew ê ciwan

Yekejimara mê: Dara Êvirsê ya kevnar.

Gelejimara herdu zayndan: Şagirtên me yên jîr.

- **Navdêrên nebinavkirî :** Î, E, EN

Y.Jimara nêr: Hespekî boz î rewan.

Y.Jimara mê: Guleke sor e geş e bînxweş.

G.Jimara herdu zayndan: Sêvine sor en şêrîn.

Gava bêjeya berî cinavê bi dengdêrekê kuta bibe, hîngê girêkok (y) bi pêşiya cinavê dikeve.

Stiranên evîne yên nûjen

4. Hevokên navane jî bi veqetandekê pêk tên.

Mîna ku em dizanin, hevoka navane, ji du navdêran yan bêtir pêk tê û bi veqetandekên (a, ê, ên, e, î, en) bi hev ve tên girêdan.

Bextê reş . Xaka welêt ya pîroz.

Dengê wî yê xweş . Gulên biharê yên geş.

* - Ji pirtûka ((ji bingehên rêzimana Kurdî)) ya Dr.M. Elî

ÎSLAM Û ZIMAN



Pîr RUSTEM

E Emê di evê mijarê de nêzîkî akam û bandoriya ku, çanda û zimanê erebî di riya îslamê re, li çand û zimanên milletên dîtir; ewên ku ketine bin zordariya imperotariya îslamê, bibin, û bizavên xwe bikin ku, hinek ronahî bidin ser mijarê û hinek xalan şirove bikin û heya em karibin emê bê alîgirtin nêzîkî mijara xwe bibin.

Ji berî her tişfî, dive em zanibin; millet û nijad bi ziman û çanda xwe tête nasîn û eger ku, tu karibî ziman û çanda miletekî bipişfînî, ew tê ewê wateyê ku, te ew millet winda kir, û eger ku, em vezerin dîroka herêmê, emê bi dehan ewan milletên ku, hatine pişaftin, weke nimûne li ser evê yekê, bibînin û di roja îro de tenê navê ewan di pirtûkên dîrokî de tête zimên, tevî ku, ew xwedî

şaristaniyîn

gewre bûn jî, lê di hundirê millet û imperetoriyên nuh de, weke ya misilimantiyê, hatine helandin.

Tiştê din ku, gereke were aşkerekirin ev e; Millet û çanda Erebi weke nijadeke taybet û cuda heya ji berî zayînê bi sed salî, weke, Dr. Wedî BEŞOR di pirtûka xwe ya di bin navê ((Evsanên Aram أساطير آرام)) de dibêje; nehatibû nasîn û ne jî ti rola ewan di dîroka herêmê de hebû, ev jî aliyekî ve, û ji aliyê din ve jî, û weke ku, lêkolînên erkiyolocî ji me re salix didin, herêma rojhilat, di kûraniya dûreka herêmê de, pir şaristaniyên mezin nas kiribûn, yek ji ewan şaristaniyan ya Aramî.

Lê yek dikare bipirse; çima me ev şaristanî û bi renekî taybet anî zimên?

Helbet pir sedem li pey ewê yekê hene, lê ya herî girîng, ewa ku, bi mijara me ve girêdayî ye û hêştiye em evê şaristaniyê bi nav bikin; Ziman û fîpên ku îro miletên Erebi bi kar fînine, weke ku ew yên ewana ne, û miletên ku ewan fîpan bi kar fînin, dikulînin û dibêjin – yanê Erebi-: Ev miletên han ne xwedî dîrok û şaristaniyên kevin in û va ye ew çanda xwe ya çêkirî bi fîpên me didin nivîsandin, helbet ev gotin ji miletên ku, ketibûn bin darê imperetoriya îslamê re ye; Mîna Paris, Kurd û heya ji berî ku, Kemal ETETÛRK bingeha dewleta Tirk ya nûjen deyne û fîpên Erebi bi yên Lafîni biguhêre, digel hinek miletên dîtir bûn.

Û wilo ew; Erebi xwe ji bîr ve dîkin ku, ev fîp bi xwe yên miletekî dinin û ewan jê girtine, ev ji aliyekî ve, ji aliyê din de jî, û ji berî ku, ewan fîpan li ser ewan miletan bi darê zorê bidin meşandin, ewan miletên ku me anî bûne zimên û yên ku, me ne anî bûn jî, xwedî fîp û çandêke cuda bûn û

me pir ziman û zarawên cudacuda didîtin û hîne jî em dibînin. Bi gotineke din; herêma rojhilatê û ji destpêka dîroka mirovantiyê ya nivîskî de, fîp û nivîsandinê cuda cuda naskirine. Ne tenê wilo û weke ku, dîrok ji me re dibêje; Herêma rojhilat, ji berî ku Erebi weke nijad xwe binas in, xwedî naskirina fîp û nivîsandinê ye,.

Û wilo em dibînin ku, akam û bandoriya pêşîn ku, îslamê li ewan miletên dîtir, di aliyên çand û zimên de kiriye, ewê ji aliyekî ve hin şaristaniyên mezin weke ya Aram hilweşand û bi ewê yekê tenê nekir, lê heya bû paşmakgirê çanda ewana jî; ango destê xwe danî ser çand û kultora ewan miletan û weke ya xwe be, bi me dide nasîn. Bi ser hemî tiştan de jî, ewê karîbû ewan fîp û kultor li ser ewan miletên ku, ji aliyê imperetoriya îslamê ve hatibûn dagîrkirin, bidana ferzkirin.

Helbet ev yeka;

guhertina fîp û zimanê dijmin bi yê zikmakî, dê bi serneketa eger ew tenê bi darê zorê ba, lê tiştê ku, dihêşt ev milletên dîtir dev ji çand û zimanê xwe berdin, -pirî caran bi dilekî û bê zordariya dijmin-, û evê nuh; yê Erebî têxin şûna yên xwe, bi xêra "pîroziyê" bû. Ola îslamê, weke hemû olên dîtir ku, di dema olên gir de, karîbû evê baweriyê bi pêrewên xwe bide înan kirin, çî bi riya gotina nerim û xweş, nemaze di destpêka bangê de, û çî jî bi riya talan û şûr.

Îro roj em bandora evê yekê dibînin ku, em milletên hatine dagirkin, me nasnameya xwe ya ethnî-çandî hêştîye û bi yeke biyanî girtiye; ji navên ku em li zaroyên xwe dikin bigre û bighe fîpên ku, em çand û kultora xwe pê dinivîsin, ta bighe ziman û zarawa me û eger ku, em li ferhengên zimanên evan milletan vegezin, emê talan û bêtara ku, ziman û çanda erebî-aramî li ser ewana binasin.

Vêca û weke ku, çawa

di salên bîstan ji sedsaliya çûyî de, K. Etetûrk bi ewê gava xwe ya girîng rabû û fîpên lafînî xistin şûna yên Erebî-Aramî, divê ev milletên dîtir jî bi ewê gavê rabin, da ku, karibin ji bin akama çand û zimanê Erebî derkevin, ewê gava pêşîn be di pêvajoya rizgarkirin evan milletan de. Ji ber ku, gava pêşîn di piştaftin an jî rizgarkirina miletekî de, jî rizgarkirina ziman û kultorê de dest pê dike.

Û em weke milletê Kurd û eger ku, em evê gavê pêknînin, li gor dîtînen me, emê di paşerojê de û li gor heyamên îro, bêtirî millet û çandekê di nav Kurdan de bibînin; Ango ne dûre ku, em bibînin millet û çanda me bûye çend par û bi navên çand û milletên Soran, Zaza û Kurmanc bête bi navkirin, û wilo ev jî me dixweze, weke rewşenbîr û ji berî ewan jî weke hêzên konevanî û dezgeh, hajî evê biveyê hebin, da ku, em vegezin ser yek fîpên nivîsandinê.

Cindirês-2006.

Xwendevav û nivîskarên hêja..

Win tekûz dizanin çiqas girîng e ku em li kêleka weşanên bi zimanênê Kurdî bisekinin û jê re alîkar bin, çî bi xwendinê û çî bi nivîsandinê. Ji loma jî em li benda alîkariya we ne.

Berêzan..

Lê eger carina berhemên we dereng man, yan belav nebûn, yan jîhinguhertinên rênivîsê tê de çê bûn, winê li me biborin, ji ber ku herkovar û weşanekê pronivîseke xwe heye, çî ji aliyê naverokê û çî ji aliyê rênivîsê de ..

Em ji we re spasdar in

LAWO

Pirtûka berêz Salih Bozan (Lawo) ya kurte çêrokan , li çapxana Hewlêrê, sala 2003 an hatiye çapkirin . pirtûk ji /14/ çîrok û /111/ rûpelan pêkhatiye .

Bêguman ev pirtûk wêjeya Kurdî dewlemend dike. Em bi hêvîne ku berêz Salih Bozan di pêşxistina wêjeya Kurdî bi serkeve. Û emê vê çêrokê ji pirtûka Lawo belav bikin.

Ê D Î N



Salih Bozan

Dibe ku ez mirovekî neyî diristim , dînim, belam li vê gotina min ecêb mebin . Gava ez rewşa xwe ji were bibêjim , winê bizanibin ku di vê gotina min de restiyek heye .

Ez mirovekî engizperest im û herku engiziyên xwe tevdidim , perestiya min kûr û

fereh dibe. Bi gelemperî cihana di mejiyê min de dibe daristaneke endîşan, çiqas têde diçim nagihêm dawiyê.

Ramanê min bi piranî ne lojîk in, weke ku di hundirî xwe de ez mirovekî dinim , mirovekî vacjayî xwe me, kes xeynî min vî mirovî di hundirî min de nas nakê, mirovekî di razeke kûr de veşrtiye .

Ji aliyekî, ez bi vî mirovê di hundirî xwe de neyî bi şerm im , belam carina ez pê pesinder dibim . lê nizanim çima dixwazim wî di hundirî xwe de biparêzim , tew carina dixwazim wî bikujim , ji tirsî ku rojekê zorê li min bike , û derkeve derve hember we xwe bi we naskirin bike .

Careke din ez dibêjim, bi vî mirovî di hundirî xwe de, ez neyî bi şerm im, ji berva fedî nakim, lê sitemkariyeke mizin lê dikim , min ew kirî zindanekê, ku ta mirinê...


nikaribe jê derkeve, wê bi min re here gorê . Di zindana min de ye jî, ez tim jê bi tirs im, tirsî min ew e, ku rojekê pêle vîna min bike û derkeve hember we, xwe bi we naskirin bike . Wê çaxê.. erê wê çaxê, winê çawa li min binihêrin, eceb ezê karibim çavê xwe rakim , û bersivên we bidim .

Herku ez digihêjim vê nuxtikê ,ez bi xwe re dibêjim , gerek wê çaxê ez xwe

bikujim "zemina bi qelêşe ku ez xwe têkim " .

Ez zanim wê hinek ji we bibêjin : ((va mirovê ta niha di hundirî te de bû ,ji ku hat ?" çawa bi dizî qeydabû?)) . Hineke din , wê bêjin ((me bawer nedikir ku yekî weha vajî te di hundirî te de dijî" .

Win dibînin çawa ez dişmtime aşkerkirina vayî di hundirî xwe de . Zimanê min êdina gule min nakî , îlem dikî min riswa bikî , bê guman ez dizanim ku vayî di hundirî min de ewiqas mezinbûye , ku êdina di hundirî min de nema hiltê . Carina li hawirdorê xwe dinihêrim , li mirovên ber çavên min re derbas dibin , û ji xwe pirs dikim :



"Gelo , di hundirî van de jî yekî dinî mîna yê di hundirî min de heye? Gelo vana jî weke min jê bi tirsî ?.

Tew yekcaran bi fêlosofî diramim, eceb civata mirovan di her demê de du civat bûn; civateke dervîn ,

a ku dîrok dizane, û yeke dine hundirîn , kesek li ser wê tiştêkî nizane , bi yên mirî re diçe gorê.

Duh tene êvarê , ez weke hercaran di kolanên bajêr de , ji xwe re digeriyam, mirov pir bûn , jin , peya, û zarok . Di nav hev re derbas dibûn , keçikan xwe gelek xweşik kiribûn, çekên tenik çîp rût li xwe kiribûn , pêsîrên wan weke du kewên di rekehê de dilipitin, hinekan ji mexsûzî bi hawakî dimeşyan, ji bo pêsîrên wan bilind bihejin, û xort jî bi keserkêş ber wan re derbas dibûn . Ji nişka ve min xast ku hema mirovekî rawestînim û jê pirs kim : "Ma di hundirî te de , kesekî din heye , kesekî vajayî te, çawa tu pê re dijî ? bi çi hawayî te derî lê girtî ?".

Di dawiya dawiyê de , ez paşde vegeriyam , û bê deng weke berê meşa xwe berdewan kir .

Bi gelemperî va rewşa min ji min re bûye pêxakê ye , pirseke roj bi roj mezin dibî , dijwar dibe , va rewşa min hîn nebese min e jî , vaye di hundirê min de derbasî xewnên min jî dibû , tew di

xewnan de, gelek azad û bê sînore bû .

Wê rojê , min hew dît , ku vî mirovî bi hawakî deriyê zindanê vekir, û beziya meydana bajêr, a tewir mezin , û dev vebû.

Ez ji we re çi bibêjim , bê rawestîna peyivî , xwe bi xelkê naskir, û pêçiyê xwe berve min dirêj kir ,û got : " ez di hundirê vî de peyda bûm ,û bi salan e ez di hundirî xwe de kirime zindanê , dixwaze min bifetisînê, tew bikuje , lê ez niha derketim , ji koletiya wî rêzgar bûm "

Ez ji we re çi bêjim, vî dîroka xwe rûpel rûpel ji wan re xwend , hemû tiştên min ên veşartî aşkere kirin û dîsa destê xwe berve min dirêj kir û got: "Va sitemkarê min e , zordarekî ne kêmkî zordarên li ser seriyê we rûniştine , ji we be ez henekan dikime , win li tiştên wî yên aşkere menihêrin, ew tiştana giştî siwaxa ruye , ji bo civata we ya li berçavane , lê di bin siwaxê de, ez heme , ez û wî em du kes in, ji hevdu cudan e, yek ji me sexte ye , eweya ... kesê ku ji we re hatî çê kirin , ez jî kesê ku wî ji xwe re

çêkirî ,ez rastiya wî me ,
rastiya wî ya ku kirî zindanê "

Vî bêbextî gotên xwe yên
weke kêran berdewam kirin û
got : "win jî zindanên di
hundirî xwe de vekin , ji bo
rastiya win hemû jê ditirsin ,
derkeve ber çavan ,û di
neynika bê mij de xwe bibînin
,ez dixwazim bi we re
bipeyivim, bi yên hundirî we
de , bila dîroka we ya derewîn
di tevahî hilweş û ew rastiya
ji ademê we de di zindanê de
ye azad bibe".

Berku careke din devê xwe
veke , û gotinên xwe
berdewam bike , ez ji xew
veciniqîm . Min gelek xu dabû
, dilê min reperep bû , firseke
mezin ez guvaştibûm , ji min
bû zirava min qetiya bû .

Min spasî Xwedê kir û bi
xwe re got : "Xêra Xwedê ku
xewn bû" .

Pê vê xewnê , du rojan ez ji
mal derneketim , û mehekê di
wê meydanê re derbas nebûm
. Dostekî carekê ji min pirsî : "
te xêre , ma tuyî nexweşî?"
Hema min kira rewş xwe jê re
bigota , çimkî vîna min gelek
zebûn bûbû , û min dixwest ez
xwe ji vê rewş rêzgar bikim "

Dûre pirsî dostê min , ez

di matmayekê de difetisîm ,
çawa ezê ji vê dukesatiya xwe
derkevim , dibe ku va engiza
dînbûna min e , a ku di
despêkê de min ji we re got
.Va dînbûna min roj bi roj
mezin dibû fireh dibû . Sedê
sed ez êdina dizanim ku vayî
di hundirî min de wê derkeve
,ez pêgên derketina wî
dibihîsime ,û wê çaxê ne bes li
hember xelkê ezê dînekî bim ,
belam pêkenokek jî bim .

Bi rastî ez yekcaran ji xwe
pirs dikim ((kî dîne ? , emê ku
dînan

dikine maristanan , lê ew
dînen timaşekî xwe ji me
venaşêrin, çi de hundirî wan
de çêdibe bi hesanî aşkere
dikin, û bi wê rastiya xwe re
dibin yek))).

Min biborînin , va
geweziya min ne bê wate ye ,
li herêma me dînek hebû, pê re
digotin Îbikê bodle . Timî li
çalan bû , ji civata me
direviya , li nav qûç û kasn
dijiya tazî dida şopa mişk û
maran , bi xwe re bilind
dipeyviya , yekcaran ji nişke
ve dikeniya.. dikeniya , te
digot wê niha bifetise ..., û
hêdî hêdî kenê wî dadiket ,
kêm dibû , niv qotî dibû û

derbasî giriyakî bi jan dibû .

Herku yekcaran nêzike gundan dibû , zarok û mezin diçûnê, mezinan bi henek û mirdalî jê pirs dikirin: ((lo Îbo.. ma tu li çolan qe ji lawir û cinaweran natirsî ?))).

Îbikê dîn dimizmizî û bi gazinc digot: ((ez ji mirovan tenê ditirsim , çimkî lawir û cinawir çi dixwazin li ruyê wan xuya dibe, ya li ruyê mirovan dixwazên wan xuya nabin, tu hew dibînî tişteki ku kesek înan neke dikin)) .

Yekcaran jî pê re digotin : lo Îbo çima tu xwe naşoyî , ma tu nabînî ,çiqas tuyî gemarî yî ?

Îbikê dîn dikeniya .. bilind dikeniya , û bi rengkî pirsyar digot ; ((ku win gemara xwe bibînin, winê bizanibin çiqas win ji min gemarîtir in))).

Hîro pê ku ez ketime vê rewşê ez Îbikê dîn bi kûranî fam dikim. Lê wî karibû ji civatê bi dûr keve , bi çolê re dostanî bike , bi lawir û hoviyan re , lê ezê bextereş çawa çareyekê ji vê rewşa xwe re bibînim ? .

Ez zanim li pêş min du çare hene ; yan vê dukesîtiya xwe bi yek kim , yan jî bicarekê van herdu kesan ji hevdu dûr

bixim.

Dibe ku win bawer nakin , hîro ez bi Îbikê bodle re me , lê ji dînbûna min re çiqas maye ku ez bi rastiya wî gihêjim.

Ez bi tenê nikarim çareseriyakê ji xwe re bibînim , gerek bi dostekî xwe re vê doza xwe bikolînim .

– "Xwedêwo .! ezê ji kêra karibim vê raza xwe aşkere bikim ? " .

lê ku ez tişteki weha bi dostekî re bibêjim , wê çiqas bi min bikene, wê xwe li serî min qurmîş bike , wek e ku di hundirî wî de kesekî weha tunene . Dibe ku ew ji min bîtir bi yê di hundirî xwe de mijûl e ,lê em weha ne ji rastiya xwe direvin .

Li taxa me seydakî kal hebû, gelekî bi nav û deng bû , ji mizkefta xwe dernediket, va bi salan e kesekî kazinceke wî nekirî , ji hemû deveran dihatin cem ji bo pirsgerêkên olî , çareseriya dijîtî û pevçûnên di nav gel de derdikevin , heta nakokiyên di navbera jin û mêran de . Pir caran jinên bê zaro diçûm cam seydayê kal , ji bo Xwedê bixwazê wan bi zaro bike ,

keçik jî bi dizî dicûn cem ji bo bi bûk bin. Bi kurtî weliyakî Xwedê ye , hinekan jî digot sira xwe heye .

Li kîjan civatê , gava navê wî dihat gotin , civat bi tevahî pesna wî bi dilên dilalijîn dikirin, tew hinek kelegirî dibûn û xwe û zarokên xwe qurbanê dikirin .

Şevê min biryara xwe girt, ku ez herim hinda vî weliyê Xwedê , û çîroka xwe bi tevahî jê re bêjim , ancax ew karibe çarayekê ji vê pîrsgirêka min re bibinê .

Êvarekê , pê nimêjê ez çûme cem seydayê kal . Bi tenê di mizgeftê de li ser yalîçeyekê ji kevnarî bêreng mabû rûniştibû, tizbiyake reş, dirêj di nav pêçiyên re derbas dibû ,û weke ku bi xwe re pistepist bû.

Serê xwe berve min zîviran û ruyê xwe tijî pîrs bûn ,dibe ku ti caran ez li mizgefta xwe nedîtibûm , çimkî min ti caran di jiyana xwe de hîn nimê nekiribû , tew di aliyê olweriyê de ez gelek zebûn bûm .

Pê ku min silav li seydayê pîr kir , bi lez min got : ((Seydayê min , gor tu dizanî ez

ne mirovekî dîndar im ,lê va bi salan e ez bi pîrsgirêkekê re dijîm , wer nikarim çareseriyekê jê re bibînim ,va pîrsgirêka min êdina gîştî astekê , nema karim tehmûl kim . Ne bijîşk karin debarekê ji min re bikin , û ne bi dost û hogiran re karim bibêjim))).

Ew pîrsên li ser ruyê Seydayê kal derketibûn çûn , û hêdî hêdî ruyê xwe vebû , destê xweyî rastê avêt riyê xwe yê gewr ,û bi min re got ((rûne kurê min ,û doza xwe ji min re bibêje))).

Min got : ((Ez du kes im , yek ez im, û yê din mirovekî di hundirî min de ye)) .

Seydayê kal gotina min birî û bi dengê nermî zebûm got : " Kurê min ez ji te fam nakime)) .

Min got : ((Min got ez du kes im , yek va ye (û min destê xwe danî ser sîngê xwe) ezê li hember te rûniştî me yê ku bi navê min xelk min nas dike , bi jiyana min e di civatê de , bi kurtî weke te : çawa di mejiyê xelkê de tu weliyekî Xwedê yî , ez jî li cem xelkê va mirovê tu niha dibînî me)).

Ruyê Seyda tarî bû, pêçiyên xwe di nav riyê xwe

yê gwer re du sê caran bir û hanî û bi dengê ji hev qutqutî got: ((ê ... pirsgirêk çi ye?)).

Min got : " Va kesê di hundirî min de dijî , dijî min e; dijî ezê ku di civatê de ciyê xwe girtî ye, ew dijî hemû zagonên civatê ye , ne bes weha , ew dervayî van zagonan peyda bû , mezin bû , û niha dixwaze derkeve derve , hember civatê Seyda yê min , wextekê ,ew hîn biçûk bû , û ezê civatî xort bûm bi hêz bûm, min karibû bi hezaran razên cûda veşartana, tew bifetisandana , lê hîro ...)) peyv di devê min de likomîn , dilê min bi carekê zelûl bû , û bi dijwariyekê min gotinên xwe berdewam kirin ((Seydayê min, ez nizanîm kî ji me rast e ? kî ji me gerek tunebe , û kî bimîne ? win ji xwe re biramin , wê çi were serê min , ezê civatî ? , Wê çaxê ezê mecbûr bibim xwe bikujim . Ez aşker ji we re dibêjim , jiyana hîn bi min şêrîn e, ez hin deşe vê cihanê nakim , gerek win bi xwe zanibin herku mirov mezin dibe , hemû daxwazên xwe dike ku zû bi cih bîne , hesta mirov bi


kêm bûna salên wî yên mayî dibe êşeke mezin . Lê ez çi ji we re bêjim , Seydayê kal , van daxwazana .. êdina bi tevahî vîna ew kesê di hundirî min de ne))).

Û gotinên min bi carekê de qot bûn , qirika min tijî istirî bû, min nikaribû êdina tiştek bigota ,û di bin xudana fediyekê de şil bûbûm , poşmaniyekê derzî di min re dikirin , û di ber xwe de min digot : " Çima min va rewşa xwe aşkere kir ? " .

Bêdengiyekê giran xwe ser me de berda , di jiyana xwe de min bêdengiyekê weha tîr nedîtibû, û hêdî hêdî min serê xwe ji bin fedîbûna xwe rakir û li Seydayê kal nihêrî .

Serê Seydayê kal gelek bi jêr de xwar bûbû , seydayê bi rûmet di hundirî xwe de digriya , hêsrên wî yên pîroz serxalîçeyê ji kevna reng winda bûbû hêdî hêdî diketin , û di bêdengiyê de çav girtî diçû . Ez pir li hember Seydayê bi rûmet bendewar mam , lê ti deng bi wî neket .

Min pirsgirêka xwe carekê din hilda milên xwe , û bêdeng ji mizgefta Seydayê kal derketim .



Zamdarê Zindî

Govdê di soqe de , bi mêkutên rojên reş hatî kutan ,retibûn û taliya bê pariyê , di dil de malk girtibûn . Roj weke kevirên qûçan li ser sîng rûniştibûn . bergeh neda bûyê ku , hulm û bihnekê bikşîne , nehêştibû ku , bi bihna gula biharê serxweş bibe . An guh li dilê xwene , bedew û tîta jînê jê re bi agahî be , tim , tim aheng dibin ewrê mûmê dabû.

Rojekê giyanê wî ji govdê xwe diqerî û lê xêlî dibû , serê xwe radikir û rêwî dibû . Digihêşt ber gelîkî kûr – kûr, avek zelal tê re mîna dezîkî mayî , xwe di ser kevirên filûs û boz re weke kurmekî dixuşîne .

Li ber wê radiweste . Bi hev re destek şor dikirin ,

dikevin qonişmekê , ji wî deziyê avê girêfatekê rengên ji xwe re dihune . di zelaliya çavên wê re xwe dixemilîne .

Ehrîman di paş zinarekî reş û mezin de , xwe veşartibû , guh li wan dina . Xwe dikir keçek şeng û qeşeng , ji firîşt û Horiyên bihuştê rindtir dikir. Bi dizî ji paş zinêr bi derdiket , diçû ba wî .

Roja te xweş be gidiyo .!

mêzekir . Çi bibîne , çi nebîne ! çavên xwe lê hilnedihatîn , Roy e , Heyv e , pertew e , gul e...Di hundirê xwe de şê- mêt dima ku , çi navî lêbike , li ber lal dibû , çi jê re bibêje .Carek din deng lêdike.

Roja te xweş be gidiyo !

Wî dengekî zirav û jar , bi tirs û fedî , çûzinî pêdikeve.

Ya te jî xweş be . wê fiqaqî ne didayê , ew li kêleka wî rûdinişt , çogan dide ber yên wî ku , karbe wê tirs û fediyê ji dil biqewtîne , li şûna wan dara pêbaweriyê biçîne . Jê dipirse : Kuro , camêro , xorto , çi bi serê te hatiye ?

Tu di vî gelî îsiz de , ezman jê ve xuya na be , li ser vî kevirî hişk rûniştîyî . bi va kurmî xwe dixuşîne re şorê dike ?

Piştî hundirê xwe kom ser hev dikir , bi dengêkî hêztir :Tişt tune.

Wê dixwast ew xwe pê bide nasîn . jê re digot : derd û kulên te hene , ji min re hewalde , dilê xwe ji min re veke , ez melhema hemî birîn û êşên te me . Ew li hindirê xwe vedigerî , ma gelo : Ev rast û îjdiliye , an xewne ? Ton keçik han , ji ku ve hatiye vir ! Ji min re çar û dermanan dibîne ?

Wê dev jê ber nedida û dibêje : Ji min bawer bike , zikê xwe bi sifreke , ez çaregirêka jîna te me . Bi bawerîk jar ew deng dike.

Ez , ez im .

Gava wê ev bêje bihîst , tirkinî li dilê wê diket , bi xwe re digot : Ev çqas navekî di hev de ye , bihna Felsefak bê binî jê tê ? bi gotnek xopînî ,jê re dibêje : Çiqas navekî şêrîn û li saz e û navê min jî “ **Xweşiye** ”, gav ev bi hevgehînin û bi hevkevin “ **Ez û Xwaşî** “ ,ev taca zindê û sedemên hebûnêne . De dilê xwe ji min re vepicirîne , weke tenên tizbiyan bikşîne .

Gava ew van peyvên filûstok û qelakirî li guhê wî dikevin , vê re dilê xwe rûdine û vedihese .

Dev vedibe , mîna çavkaniyekê bêje jê dizên .

Ez rêwîme , rîya min dûr û dirêj e , mîna marekî reş xwe kilor kiriye , westiyame , fîn – fîna tîbûna jinê , di dilê min de weke kizotê komira ser peçnî dimixmîxe , gulmekê jê vexim , ku , wê tîne vemirîne .

Xwaşiyê : Hîn bêje , canê min , gotinên te bi min weke vexwarina Sewme heme ye . Van gotinên dawî gelek li zarê guhê wî xwaş dihatin , mîna gopalê kirîfê serxweş guhên

wî dikute , ew dibe dilê wê û dibêje :

Xwaşıya min , ez bêganim , bêganê welatê hundirê xwe me , bêganê bêgana , welatê avê ..., dengên Bilbilên min tên dizîn , di çavên sibê de keskayiyê dikujin , şewqa heyva min kûrik dikin , dikin û dikin . Dibêjin çare û derman li ba keça padişahê welatê avesûna tîtikê heye . Ez derim wînim , ku , vejînim . wê weke dûvpişkekî xwe berdide qulê , weha jî xwe berdide hundirê wî . jî daxwaz û hêviyên wî veneduhesî û pê qayl nedibû , hûrik – hûrik li ber wan radiwestî û pê re dipeyvî :Ha ho , canê min , bejin şêrîno jî hinguv , şerme tu bêjî ev derd û kul in , çare dermanê van bi çavdamirtandinekê re , jî te re bibînim , weke piyalek avê li ber te dînim .

Çawa dil zîzê bejin ji dara qîzê ?

Tu êş û kulan di dilê xwe de hilmegrî .

Ma tu kî yî rê li ber min dûz û ronahî bikî , min ji deriya bê ganiyê rehbikî , dengên Bilbilên min vegeirî ,

Pîrs – Hejmar 35 rûpel ~~~~~~38

keskayiyê vejîni , rûyê heyva min geşbikî !

Ev çi dudilî û bê hêmenî ye , berî her tuştî , destê xwe bi min de , bi hevalê minî rê be . Ezê te di riya kesî negirtî re rêwî bikim , bibim welatê kesî pêlê nekirî , welatê zêr û zîv , rûn û hinguv û ...Lê , tu dev ji van gotinên pûç û lûç berde . Lê ,vê şîretê mîna şîşik sorkirî di dilê wî re derbas dibû , hiş vecniqand û ditengijî , mirûzek diçû û yek dihat , bihêrs digot : Ez û armancên xwe ji hev in , heyîna min yê giyanîne .

Wê bi çav xinanî lê mêze dikir û digot : tiştê ez dibêjim , jî berjewendiya min û te ne . Lê , tu zanî , gava dev jê bernadî , bermede , li zor nakim ,digel wê hevalê te me .

Di ber devê wî re dikenî , diçû û dihat , kela dilê wî dirijand bi destan digirt û rakêş dike ,digot : Rabe em herin .

Ew li hespî bê sîwar dibûn û rê diqelişandin ,qeşafî bi hev dikirin , teq – teqa kenê wan bilind dibû , mirî şiyar dikirin . Wê serê wî dikişand , di riya wê dixwast re dibir ,

sînorekî bê taqim re derbas dikir. Ew jî wê dipirse : Em derbas ku dibin ?

Em dikevin welatê bê sînor , yê zêr û zîv , dadê û wewkheviyê , rûn û hinguv... Ezê te li hemî taxên wî bigerînim . Ev welatê li ser riya welat tu diçû yî ye.

Bi rê de rastî komek mirov dihatin , yên simêl û rîh tev hev bûne , di axafitnek germ de ne û li dor tenûrekê dîlan girtin , têde dest û ling dişotin .

Ew jê dipirse : Ev kîne , çi karî dikin ? Lêvedigerîne : Ev kesên bona ramanekê dijîn , û yên tewrî binave in . wî serê xwe dileqand û lêbên xwe gezdikirin , bê deng derbas dibûn . Hê diçûn , digihêştin nav daristanek di hev de û kanîyek di nav de diza , zarokin bi basik li ser daran difrîn û dinîştin .

Dîsa jê dipirs e : Ev çine ?

Ev biçûkên bi çûk hatin kuştin . Bûne daniştên vê daristanê , piraniya van Hroşme û Naxazakî , Helbce û Filestîna ,...

Carek din bê deng derbas dibûn . Demek baş bi rê de diçûn , rastî hindek mirov tên , sundî di lingan û hefsar di mêjiyan de ne , li ser sergokî girêdane .

Vê carê ew jê napirs e . Lê , wê jî xwe serî jê hewal dide .

Evana ew kesên ku , li ser komên zêr û zîvan rûniştine , tîn û bihna nirxa ne diçûn tukesî , ew bi mîzê hêstira komkirine û digel xûyê hatine histran û di bin de bûn sergo û pê ve hatin girêdan .

Ew di hinava xwe de şet mêt dimîne . Lê , pîrse di xwe de diruquçand û derbas dibûn . Çûna xwe hê berdewame , rastî refek ciwanên nêr û mê , rût û tazî dihatin , bi hev re piyalên vehesa cên vedixwerin . Carek din ew pîrs nake û dexwaze bi lez derbas bin . Wê jî bi lez û sê çar carkî jê re digot : Ev frîşt û horiyên vî welatîne .

Di pîr cîh û deveran re derbas dibûn . Li derekê diskinîne û jê re dibêje : Ev rawestgeha me ye . Emê lê vehesin . Ew cih gulîstanek serbixwe ye . wî li dor xwe bi

çavin elînî mêze dikir , di temenê xwe de tu der han ne ditiye . Ew derbas odakê ji odên wir dibûn yên çar dîwarên xwe vekiribûn . Têde masak ji zêrê canê mirov çêkiribû û du kevil(kursî) ji zivên xewnan bûn . Li hêla din textekî xewê , ji rengên gul û kulîkên ruquçî çêkiriye , li ber masê rûdinin , wê diçû du piyal danîn û dida ber wî . Wê digot : Ev herdu piyalan ji embîz û niktare ne , digel hinguv û şîr e , wê ev tev hev dikirin û dihistra , di di lêv û henarîkên xwe dixemiland , por bi ser bejna xwe hêldike , li ber rûdine . Jê re dibêje : Îro lêv û henarîkên min xwerin û vexwerina te ne . Ji te re taştî û firavînim . Rojek xwe ji felekê bidize . wî lêvedigerand :Tu çl dibêjî , ez ji ton karin han dûrim , Gava bi çûk bûm , diya min digot : tu rojekê karekî nerind bikî , ezê şîrê xwe li te helal nakim . Ji ber vê tu yê li min biborîne , ez nikarim bi vî karî rabim .

Ew temî û şîretên diya te ji çûkbûna te re bûn , ew ji wê demê re mine . Lê , îro tu bûyî mêr .Wê di ber gotinan re devê kirasê Xwe vedikir ,sîngê

Kalî gewr û gupkên nuh dipişkuvin û lê dimand . Tamarên pêla mêrantiyê hino – hino pê re radibûn .Wê tim ew bi şor û gotina dixist û peyvên mê pê re dikirin . Ku , kefa pêla wî di ser berxwedanê re birije . bi kunê çavên xwe yên behîvî û li yan lê mêze dikir , bijangên xwe



mina dîvê Tawusan hiltîne û datine , bê ba li rûyê wî dixist . di dorê re bejna xwe li ba dikir û dirêst , li hemberê xwe şîlf tazî dikir û deng lê dikir : Were tî û birçiyoy , dil kizoto , xwe nerm û hênîk bike , me tîrse , ro heyv û bilbil te nabînin , bila tu pişt rast bî .

Bi wê dîmenê re , pêlên dilê wî li rêz pêlhev dikin .birûsk li hev dikevin , li ber wan pêl û birûskan bilbil , heyv û bêjeyên diya wî di cîhana paş mijiyê wî de diqêrin . Ji nişka ve hespekî sipî bi basik li ber wî der dikeve , pê digire û davêje ser mila xwe , difire li ber derîkî

datîne û jê re dibêje : Ev deriyê welatê avesûnê ye . Bi dengê êşkencekar re û satilek ava sar biser wî de loş dibû , ew çavan vedike , di nav lingên xwe de ,

lîçek ji xwîna meyî kom bûye dibîne û jê re digot : Segî ji segan hê xewnan dibîne û li hespî sipî sîwar dibe .

Ji pirtûkxana Kurd

* Pirtûka helbestvan **Yasîn Hisên**, ya bi navnîşana ((Teberiya benefşan)) giha destê me. Minoliya vê gurzê helbestan ji /36/ helbestan li ser 81 rûpelan belav dibe.

Em ji helbestvan Yasîn Hisên re dilşa ne, ku ev xwe çapkir. Em hêvî dikin ku bi ev dîwana xwe, wêjeya Kurdî dewlemendtir bibe. Ev in çend malik ji rista bi navê ((dayê)):

Dayê


*Ya ku destbijatî
Ji nava xeman
Ya ku di nava
Vê jiyana gezende de
Bûbû hêlîna*

*dilovanîyê
Dayê..
Dimînim mat
Bê çawa perîşanî
Li rûçikê me tê ...*

* Destlata Helbestvan **Temoz Şemalî**, gurzek helbest, bi navnîşana ((Kulxana gundên jibîrkirî)) , ji me re rêkiri bû. Ev pirtûk bi 99 rûpelan hatiye çapkirin û di hinava xwe de, 43 rist hilgirtine. Daxwaza me ew e ku, helbestvan Temoz Şemalî di nivîsandina xwe de, bi serkeve û wêjeya Kurdî bixemlîne. Emê vê helbestê ji xwendevanên Pirsê re biweşînin.

Du caran

*Du caran dimirim;
Carekê
Dema li welatê min
Şerê birakujiyê*




*Vêkeve
Û carekê
Dema Şanzdehî Şibatê
Tê bîra min .*

Pirs – Hejmar 35 rûpel41

*Du caran jî, vedijim;
Carekê
Dema leşkerên dijmin
Ji pêşa Pêşmergên me
Direvin
Û carekî*

*Dema şagirtên dibistanê
dibînim
Bi zimanê dê
Dixwînin.*

* Li vê dawiyê gurzek helbest, bi navnîşana ((Pêlek ji deriyê viyanê)) ya helbestvan **Merwan Berekat**, bi destê me ket. Ev pirtûk ji 29 ristan û 68 rûpelan pêkhatiye, bi pîvana xwe yê orte hatiye çapkirin. Em hêvî dikin ku, helbestvanê me karibe di helbestê de bide ser riya avahiya wêjeyê.



Zengilên bê navik

*Li ber robarên kelogirî
Gul tî...
Û bê reng mane
Li rehên xwe digerin
Ewrên revoke
Dinalin û digrîn
Qurnefîl...
Û perwan
Di sîngê mêrgan de
Li gorên xwe digerin
Ji çiraxên çemên tî
Kendalên ji qûmê
Ramûsan
Diyarî firtenan dikim*

*Û şev bi rojê dikene
Bi benê Kevzê
Ji gola tariyê hildikşand
Hê ...ê ...ê ...ê Felek
Bes e zengilên şahiyê
Di sitûyê demê de
Bê navik bileqîne
Bes e ...
Çavên ronahiyê
Bi kila kurbûnê
Kil de
Bes e birînên me
Bi êşan derman bike*

BÊHÛD

(1878~1955)

Dîsan qapîyê xemê Li me ve bû
Pergayê tereb ji a'lemê dil hate girtin
Dîsan ceger kirne kenarê mişeqet
Yanê dikana çerxa cegerê Ve kirin
Dîsan birîna kevne xemê Me xebitî
Dîsan ji herdu çavan weten bû gola xûnê
Hesîr mîna fewartê Ji dil hilqolîn
Dîsan lîva xezaye ji lîva û nehîya qezê
Bo kurdê Qurbeser bi mezel helkirin
Stêra birca hequqê Wî bû weten
Îşev nişkêva kişîya û carekêva hate kuştin
Daxa xemê Feraqê Danî ser cegerê
Birîna hezar salf dil wa K:olîya
Girîya û got: "weten cegera min hate birîn"
Şewga çira meclîsa xûret hatîye kuştin
Ey çerxa bed mea "mele heta kengê xeta bikî ?
Vî kurdê Bê kesî bi xem eşna bikî
Heta kengê Lazime danê Bikî ar ?
Heta kengê Xirman ê'mrê me ba bikî?

(Dîwana Bêhûd; laperê96~97)

Nikilên tar

Oflaz

Heger dîlikê	û sinatîkên sor	qederê
qederê	tev	bi destên min ba
bi dest min keta	noşîn bikirana	minê
minê	Heger deriyê	rûpelên xwe tev
hêstir tev	qederê	sipî bihêştana
ziwa bikirana	bi dest min da ba	Da ku
û çiqasa	minê	her evîndarek
rûken hebana	evîndar tev de	helbestek xwe
minê tev	di hundirê	lê binivîse
şax bidana	noşînê de	her çivîkek
Heger kutikê	bi meyandana	hêlînek xwe
qederê	û çiqasa	lê bilûsê
bi dest min keta	ustirî hebana	û her
minê	minê tevde	wênevanek
nikilên tar	di agirekî tar de	perên xwe
tev de	bi şewitandana	bi meşkîne
kol bikirana	Heger nivîsandina	

Hevdîtina pêxembera

Dîlan Şewqî


Gava çipkên wê baranê
Ax dikir hinne
Tarî bi demsala di xemilî
Li wan çiya
Te ji min re çavlêgerînek
veşartibû
Lalake ne jêkirî
Û nanek
Xuşxuşa çarînên xeyam
Lehyek ji lîlava evînan bû
Wê riyê
Çi ji tera di got
Ya wan darên ko bibûn
Ezmanekî din
Masî di mijê de
Destê bahozê badidin
Sema li gelyê zîlan
Pasvanê dîlbera ye
Min dubhujînin çavên vî
welatî
Rezê ko rapelikiye sirgûngeha
Roka li ser enya sibê
Û qulwelkên qedexekirî
Cotbûna me
Bi çî ji tere mukurhat
Ya wî karwanê ko
Li isra û miraca xwe bû
Tê bîra te
Gava sêverê mehra min û te
Birî
Kevir ketin
Tavika avis beravêt

Endîwar ne miçiqî
Abêya amûdê şînhat
Ez sarnebûm
Ne rvyam
Min kula xwe
Avêt ser rista yaseyên
Ko ji sedê dastanan de
Bûkbûna min xaçkirine
Tê bîra te
Dema te di got
Ey yara min
Ey meygera nêrgizan
Tu jî wek savo
Porê xwe bi tîrsa zembîlfiroş
Şil dikî
Wek ferêt
Tu devsistiyê nizanî
Erê erê hûrî
Şehrîstanîne xemên te
Ava çema
Zadê paldayî ji ber te
Radibin
Û tu xûzbûnê
Nizanî
Buhara te
Kilîta buhiştê ye
Û
Piştî te
Bi şîrê evsan
Têre
Dema limêjên hembêzan
despêdidin

Tu û sermê
Çi ji hevdure dibêjin
Ey dildar
Bera êtûn bi axife

Bê lepik
Sitriya rake
Soz darin
Awirên te
Cezêrana cizîrêne
Wêrekin wek berbangê
Li ber sirûdên pêla
Hevdîtina pêxembera
Di azire
Hilk hilkên xwas
Cirîda ewran tînin
Bîra xwe
û
Narîniya vê xakê

Gulan 1998



Ziryiya hespehî licê
Evîna dengbêjekî deşta
bişêriyê

Cegerê
helbeste
ke
Cegrwx
în
Dewrên
feqehêkî
SERHADA

Begneke qolan kirî ,
Bi xan û manin axî
Bi dilin kewandî ,
Di jînehê bargiran de.
Şîn û şahîyke tevlî hevi
Di şeveke taveheyv de

Bi sehwa û leng derbasî
Kolanên te dibim .
Pêlên derya te ,
Qeyha min dihejînin.
Sawîra zavakî şeva pêşî
Dilê min digre, û
Bi şûnde dizîvirim
Qamişlo :

Ayî//
neke mêjewî
Qolaneke kespik kirî
Ji kardox û kasan
Aşûr û akad.....

Hawîrdora te , dîrokek

nivistîye

Raza ye

.....

Zar û zîçên

serberdayî

Di nav ax

û maxê de

Bi antîkên te , dilîzin

Rojên xwe pê dibûrînin , .

Qamişlo :

Sirûdeke zêrîn

Ji yewrîa gala karda

Awazeke bilbilên baxekî
zozana

Xemle ke xortanî , di

dilaneke gelêrî de ,

Qamişlo : kut – kuta dilê

Mê keweke ser hêlînê

Bexitreş (Bavê Memo)

Rehmê Bike

Nûsîn Bêcirmanî

Çav hingivê navêje dil
Daxa te va wî li ser dil
Payîz te anî biser me de
Lêv şekirê rengê gula
Sewdan û hiş barkir bilez
Dil herifî nûbûn kul
Sitemkarê dil şa bike
Bes wî dilî bindest bike
Hêz nema dilber bese
Hêvî û lavê jê dikim
Carkê li min rehmê bike

Tîr û kevanên şêt û har
nema li ber min gund û şar
Zer bûn li min bax û dar
Şeş sed peyal min jê vexwar
ji ser çiyar de hatim xwar
carkê bide gulek xewar
navêje dil derbên xedar
Tîrên te çûnê bê jimar
da vegere li min buhar
qey nebese dil bû ar
da şûv li min nebe beyar